



Efrîn di bin dagîrkeriyê de (241):

Bajaroka "Şera" - dizîn û guhertineke demografî, girtina jinekê û herçar zaroyên wê, dijîkirina ser temenmezîna û dizîna wan, komelgehên niştecîkirinê li şûna zewiyine zeytûna



Erdheja /6/ê Reşmehê, tewana Newroza Cindirêse ya bi robet, û cersandinên ku rastiya siyasetên Turkiyê yên li dijî Kurdan aşkere dikin, ji binpêkirin û tewanên Milîseyên "Artêşa Niştîmanî ya Sûrî"/ Hemahengiya Sûrî - Ixwanî re li herêmê nebûn rêgir, ji ber ku ew di bingehe de ji cîbicîkirina siyasetên Hikometa Dad û Geşepêdanê bi serokatiya Erdoxan re destik û nandoz in; Evên jêr jî hinde bûneyên ku wê tekez dikin in:

= B. "Şera":

Ew navenda navçe ye, /16/KM ji Bajarê Efrînê dûr e, ji dora /250/malî pêkhatî ye, dora /1300/nişte ji nişteciyên Kurd ên resen têde bûn, piraniya wan di dijberiya ser herêmê de li destpêka sala 2018an. Z penaber bûn, jê dora /130 malbatî = 400 nişte/ vegeerîn û yên mane zorane koçber bûn, û dora /160 malbatî = 800 nişte/ ji anîndeyan têde hatin nişteciêkirin.

Di encama topebarankirina bajarokê de ji aliyê Artêşa Turkiyê û nandozên wî ve li dema dijberiyê, ziyanên piçekî û tonbiton gihîştin heft malan, û kevana derbasgeha bajarokê hate roxandin; Û piştî desteserkirinê ji aliyê Milîseyên "Firqit El'sultan Melekşah" ve, mala/vêla "Ebdo Şe'ibo" yê zorane koçberbûyî ji xwe re kirin biryargeheke leşkerî, avahiya guvêşgeha zeytûna ya herdu ortaqaan koçberê zorane "Rehman Qehreman" û dilovanber "Rif'et Hemîd Hemdoş" ji xwe re kirin biryargeh û hepseke taybet, piştî ku tevahiya acet û aletên wê dizîn; Û weha jî dizîna xwarinvexwarin û firaxên baqirî û cerên gazê û alav û amûrên malane û yên din ji malan, hemî heyînen dora /120/ malên dest danîne ser, destdanîna ser heyînen hejmarek dîkanên pêdiviyên malan, aletên nanpêjgeha otomatîk a Rêvebiriya Xweser a berê (a ji nû ve ji bo serkêşên Melekşah bi aletin din hate amedekirin), dora /25/ makîne û tirektorên çandiniyê, dora /30/ avkêşekên/xetas bîrên irtiwazî yên malan, giropeke zayenda elektrîkê ye mezin (ampêrat) e "Rehman Qehreman", jimarokên avê û yên elektrîkê yên malan, giropeke hilkişandina ava vexwarinê ji bîreke taybet e sê gundan (Şera, Xirabê Şera, Sînka) ye ku paşê bi aletine din hate amedekirin û bikaranîn, amûrên toreya enternête ye taybet, heyînen sê dibistanan û guhestina avahiya dibistana navîn bo biryargehekê ji "Asayêşa Sivîl" re, hin heyînen mizgeftê, guheztok û kebil û beşek ji dîrakên toreya elektrîkê ya giştî (ya ku ji nû ve ji aliyê fabrîkeyeke Turkî ve hatiye çaksazkirin û bikaranîn), û kebil û stûn û amûrên navenda telîfûna zemînî.

Û "Melekşah" vêrgiyeke mezin li ser xwediyên du guvêşgehên zeytûna li beramberî ku aletên wan neyêne dizîn ferz kir, û weha jî vêrgiya /10-20/% li ser berhema werzên zeytûna, bi taybetî li ser malmewdanên hemwelatîyên ne li wir û destdanîna tevahî li ser beşekê jê.

Û wê ji bo êzingkirin û bazirganiyê darên îhracê yên temenmezin li dor gund û dora sed darî zeytûnê qut kirin; Û ji bo lêgerîna li kevneşop û kinzên binerd û dizîna wan, cîgehine dîrokî kolan û tevdan, mîna Zaretgeha "Ebid El'mewlane" li Rojhilatê bajarokê, bi ser de jî darên wê yên temenmezin qut kirin.

Û di çarçewa tevgereke olî ye tund û çalak de li herêmê, mizgefteke nû ji aliyê herdu komeleyên "Jiyankirina bi Rûmet/El'eyş bî Keramê, û Destên Sipî/El'eyadî El'beyda'i" ve hate avakirin, bi ser de jî hejmarek korsên olî hatin lidarxistin, û ezmûnkirinên zimanî û olî jî ji mamosteyên dibistanan re ji aliyê kargêriya fetwan li Şera ve (ya ku "Umer El'faroq" miftiyê Wîlayeta "Hetay" a Turkiyê li 3.3.2021an. Z ji bo serpereştiya rêvebirina kar û şîretkirinê seredana wê kiriyê) hatin çêkirin; Û herweha jî vekirina "Gulîstana

Gupikên Buhîştê/ Rewdit Bera'ê El'cene" li 22.3.2021an. Z ji aliyê "Hisên Baş" - miftiyê Fatêh Istanbûl û li ser serê şandeke serokatiya kar û barên olî ye Turkî ve.

Weha, xelkên mane jî rastî cûrbecûr binpêkirinan hatin, mîna revandin, girtina bêşûcane, îşkencekirin û peresitandin û yê din hatin, û bi dehan jî bi demên têvel hatin hepiskirin û digel ferzkirina sezayîne diravî, bi tuhmata têkeliyê bi R.X a berê re.

Bi bîr were jî ku serkêşê Milîseyên "Fîrîqî El'sultan Melekşah" "**Mehmûd El'baz**" e, cîgirê wî "**Fadî El'Mûse El'salêh/Fadî El'dêrî**" ye û serokerkanê wê jî "**Ehmed Elî El'îse/Ebû Bîlal Hinêş**" e, yê bi destdanîna ser pir malmewdanên Navça Şera û zordariya xwe li ser ademîzadiyê navdayî.

= Girtinîne bêşûcane:

- Li 23.3.2023an. Z, Milîseyên "Asayêşa Leşkerî li Efrînê" hemwelatî "**Şêxo Luqman Hemo /27/sal, Mihemed Luqman Hemo /16/sal, Şêxo Ferhad Hemo /17/sal**" ji xelkê Gundê "Dîkê" - Navça Bilbilê û "**Xelîl Idrîs /17/sal**" ji xelkê Gundê "Hecxelîl" - N. Reco bi tuhmetên çêkirî girtin.

- Li vê dawiyê di hevdîtinên wênekirî û belavkirî de, Hemwelatî "**Idrîs Mihemed Mûse /40/sal**" ji xelkê G. "Çeqmaqê biçûk" - N.Reco -ji dawîya sala 2022an. Z ve penaber e û li Welatê "Nemsa" rûdine- tekez dike ku hevîna wî "**Dicle Cemal Bekir /30/sal**" û **herçar mendalên wan /2-12/sal** ji çend heyvan ve di Hepsa "Hewar Kilis - Ezaz" de (ya ku Milîseyên Fîrîqî El'sultan Mûrad û Istîxbaratên Turkiyê bi rêve dibin) dûrî cîhana derve bendkirî ne, piştî girtina wan li 5.1 2013an. Z û barkirina wan ji Istanbûlê - Turkiyê (ya ku di bin sîstema parastina demkî de lê rûdiniştin, û li benda lihevkomên û çûndina Nemsa bûn), li dû nerazîbûna "Idrîs" ku danûsitandinê bi Istîxbaratên Turkiyê re bike, û bi ser girtina wî ji parêzerekî Turk re ji bo lêgerîna li endamên malbata xwe.

= Geregoşî û serberdayetî:

- Li şeva 25.3.2023an. Z, li Gundê "Îska" - Şêrewa yê ku Milîseyên "Feyleq El'sam" desteser dikin, çekdarina mala temenmezîne nexweş "**Yihye Şukrî Hemo**" -yê di nav nivînan de û tevî hevîna xwe bi tenê rûniştî- basmîş kir, mekin lêxistin û di encamê de destê jinikê şikest, û tibabeke diravî û du amûrên xilyewî jî ji wan dizîn.

- Li 1.4 2023an. Z, li G. "Xezîwê" - Şêrewa yê ku Milîseyên "Feyleq El'sam" desteser dike, çekdarina bi şev mala Hemwelatî "**Rif'et Elî**" basmîş kir, bi behaneya lêgerîn û şopandina hin kesên daxwazkirî, û endamên malbatê di odeyek tenê de bend kirin, û jê hin tişt dizîn.

- Li 3.4.2023an. Z, li dema belavkirina alîkariyan ji aliyê "Dezgeha Berzanî ya Xêrxwaziyê" ve li G. "Xirabê Şera", di navbera çekdar û anîndeyî bi ser Milîseyên "Fîrîqî El'sultan Mûrad" ve, bi sedema geregoşî û nelihevkirinê li ser xistan, devavêtin û şerek çêbû û qurşîn hatin avêtin, û hin kes birîndar bûn û hin din jî derizîn, û ji ber wê dezgehê nikanî karê xwe tewaw bikira.

- Li 3.4.2023an. Z, çekdarina ji endamên Milîseyên Nûr El'dîn Zenkî -li gor jêderine ragîhandinê yen xwecihî- "**Falêh El'dîrawî/Ebû Zêd**" e ji Şamê" û ji anîndeyî li çadîrgeha "Dêrbelûtê" - N. Cindirêse rûniştî - Ro li nîvro- bi qurşînê kuşt, li ser nelihevkirinê berê.

- Li 4.4.2023an. Z, li orta Kolana Reco ya qerebalix/qerebaliq li Bajarê Efrînê -ro li nîvro- tibabeke diravî (1400 Dolar Emrîkî û du hezar Turk) ji temenmezîne Kurd "**Mihemed Elî Dehdo /72/sal**" ji xelkê Bajaroka "Be'idîna" girtin û bi matoreke duloqî revîn, piştî ku fêlbazî lê kirin da ku perên xwe ji berîka xwe derîne; Were zanîn jî ku ew pere buhayê pîkaba wî biçûk a ku li siba wê rojê firotiye bû.

= Komelgehên niştêcîkirinê li şûna zeytûna:

Di çarçewa hewildanên Dagîrkeriya Turkiyê û alîgirên wê de, ji bo daqultandina bêtirîn erd û zeviyan çandiniyê û guheztina wan bo komelgehên niştêcîkirinê, û hiştina anîndeyan li herêmê bi rengekî berdewam ev pêngav hatin kirin:

- "Ebû Elî Şerqiyê" ji Dêrezorê û yek ji serkêşên Milîseyên "Ehrrar El'serqiyê" zeviyeke zeytûna bi rûbera çar hiktir û nîvan a "Xelîl Erebo" ji xelkê Bajarê Cindirêse bi navbênciya simsarekî ji Bajaroka Kefirsefrê kirî.

- Çadirgehek ji anîndeyan re li ser erdekî -piştî hilkirina /325/darên zeytûna jê- hate avakirin; Hêjaye were zanîn ku ew erd li Bakurê Riya gundên Baflor - Yalanqozê Bakurê Cindirêsê dikeve, yê "Nebîh Xelîl Mûrad" ji xelkê B. "Kefirsefrê" ye, û ji aliyê bazirganine ji Bajaroka "Encarê" - Gundewarê Heleb a Rojava ve hatiye kirîn.

= Binpêkirinîne din:

- Ji dora pênc heyvan ve, "Kemal Mihyeddîn El'eşqer/Ebû Hido" yê ku bi navê "Hatêm Ebû Şeqra" - serkêşê Milîseyên "Ehrrar El'şerqiyê" li N. Reco kar dike û dilive û bi zordariya xwe jî xwe vedine, û ew bi talankirina malmewdanên xelkê an ferzkirina vêrgiyan li ser navdar e, rabû Hemwelatî "**Nûrî Bilo yê bi Xocê Bildînê** tê naskirin - mamosteyê rewatiyê û berê îmamê mizgeftê" neçar kir ku /11/hezar Dolar bidîyê, beramberî gilîhîlanînê ji ser û serbestberdana wî, piştî ku ji aliyê Asayêşa Reco ve hate girtin, bo Efrînê hate rêkirin û di mercên zor diwar de /15/rojan bendkirî ma, li dû giliyê hemwelatiyekî li ser nelihevkerinîne şênberî li dijî wî pêşkêş kiribû.

- Li vê dawiyê, Milîseyên "Firqit El'hemzê" dora /45/darên zeytûnê yên zaroyên "**Şêx Ebid El'qadêr**" ji xelkê Gundê "Bablîtê" - Efrînê bi rengekî bêwijdan qut kirin.

Girtin û bendkirina çar mendalan tevî diya wan û veşartina wan bi şewakî zorane di mercên sert de û bê têkildarî bi derve yan bi xwedîyan re tersiyeke mezin e ji yasaya/zagona mirovahî ya navdewletî re, û bi ser de jî barkirina wan a zorane ji welatê penaberbûnê(Turkiyê) ji bo xistina xwediyê malbatê bin zext û fişara pejiwandina hin şert û mercan.

09.04.2023 an

Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn

Partiya Yekîti ya Demokrat a Kurd li Sûriyê

Wêne:

- Şûnewarê topebarandin, roxandin û dizînê li B. "Şera".
- Serkêşên Milîseyên "Firqit El'sultan Melekşah".
- Qutkirina dareke sindiyanê ye temenmezin li B. "Şera", ye Malbata "Qehreman".
- Çalakiyine olî bi serpereştiyeke Turkî li B. "Şera".
- "Dicle Cemal Bekir" ya girtî û herçar zaroyên wê.
- "Yihye Şukrî Hemo" û hevîna wî yên ku dijîti li ser hatiye kirin.
- Çadirgehek li ser erdekî hatiye avakirin, berê zeviyeke zeytûna bû û ji aliyê xwediyê wê "Nebîh Xelîl Mûrad" ve hatibû firotan.